## Rapora salane ya Navenda Azadiyan di Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê «SKJN»

## 2025: Sala lêgerîna rojnamevanên ku bi zorê hatine windakirin

### Pêşgotin:

Di rewşên ku cîhan bi guherînên siyasî, şer û pevçûnên çekdar yên ku rû bi rû didin, rojnamevan her tim ji wan kesên herî ku rasî zorê û dijwariyan dibin, ji ber ku ew dixwazin veguhastina rastiyê û bi pênûsa xwe ji bo dengên azad yên civakên ku bi van pevçûnan bandor bûne, diparêzin û rastiyan li ber raya giştî ya navxweyî û navneteweyî eşkere dikin. Ev bi taybetî dema ku karê wan yê pîşeyî û sincî di navbera şerê de be, yan jî di bin zordariyên rejîmên stemkar de ku azadiya nerînê û peyvê têk dikin, û li ber komên çekdar yên ku her dengê ku planên wan têk bibin armanc dikin. Ev tişt di rapora salane ya sala 2025 ya Rêxistina **«Rojnamevanên Bê Sînor»** de jî hatî piştrastkirin; ku got pirsa rojnamevanên windabûyî û yên dîlkirî, yek ji ya herî zore  ji rûyên tundiya armanckirina li dijî azadiya ragihandinê û azadiya nerînê û derbirînê ye, ne tenê encama şer û pevçûnan ne. Li gorî pîvana Cîhanî ya Azadiya Rpjnamegeriyê, Sûriye li dawiyê rêzê ye.

Ji vir ve; Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê «SKJN», ji roja damezrandina xwe heta îro, bi berdewamî li ser şopandin û tomarkirina binpêkirinan yên ku li dijî rojnamevan û kesên ku di warê ragihandinê de dixebitin li Sûriyê. Her weha, raporên salane amadekirin ku li ser standardên pîşeyî û yasayî yên pejirandî têne damezrandin û bi peyman û mercên navneteweyî yên taybet bi azadiya ragihandinê û parastina rojnamevan re li hev digirin. Ev kar bi rêya Navenda Azadiyan ye, ya girêdayî bi Nivîsgeha Şopandin û belgekirina Binpêkirinan di nav toreyê de, tê pêk anîn.

Her weha toreyê di hemû rewşên binpêkirinê de di nav herêma erdnîgarî ya ku tê de dixebite de, yan jî di rewşên ku pêdivî ye li derveyî çarçoveya karê wê ya li ser hemû Sûriyê hatin belgekirin, belavkirina daxuyanî û peyamên gefekirî û piştgiriyê dike.

Armanca van raporan ewe ku ronahî li ser rewşa azadiya ragihandinê û rojnamegeriyê li Sûriyê bike û binpêkirinên ku li dijî rojnamevan têne kirin – wek girtin, windabûna bi zorê yan jî kuştin – bi dest nîşan bike; her weha rewşên ku her çend giranîya wan kêm be jî, pêdivî ye ku li gorî yasayan û standardên navneteweyî werin belgekirin. Ev ji bo hişyar kirina civaka navneteweyî û rêxistinên têkildar ên ku li ser parastina rojnamevan û piştgiriya wan dixebitine, li ser zordariya domandina bê-tawankirinê û pêdivîtiya girtina gavanên kiryar ji bo parastina rojnamevan û mafê wan ku bi aramî û serbixwe, dûr ji her agendeyên ku bi karê wan yê pîşeyî re li dijî hev bin, bixebitin.

### Em kî ne?

Nivîsgeha Belgekirin û Şopandina Binpêkirinan bi Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê «SKJN» ve girêdayî ye; ku çarçoveyek rêxistinî ya ragihandinî ya serbixwe ye. Ev tor armanc dike ku li herêmên ku tê de heye, azadiyên rojnamevanî biparêze, bê ku li ser bingehên zayend, ol, nijad, yan jî baweriyên dezgehên ku rojnamevan tê de dixebitin, yan jî aliyê ku binpêkirinê dike. Tor di nav rêzên xwe de rojnamevanên Kurd yên Sûrî û her weha rojnamevanên ji pêkhatinên din yên li Sûriyê û derveyî wê digire.

Tor di 10/3/2012 de hate damezrandin; û di destpêkê de bi navê **«Yekîtiya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-YRKS»** tê nasîn. Ev pêşwazî ji aliyê komek xwendekarên zanîngehan yên Kurd, ku ji kulîceya Ragihandinê ya Zanîngeha Dîmeşqê derçûbûn, hate kirin؛ ku pêdivîtiya bilindkirina astengên rewşa ragihandinê ya Kurdî û her weha pêşkêşkirina rewşa Sûrî bi giştî û ya Kurdî bi taybetî, bi aliyekî bêalî û pîşeyî, dûr ji her cureyê alîgirîya siyasî yan jî partiyetî.

Nav ji **«Yekîtî»** veguherî **«Tore»** li gorî biryarên Kongreya çaremîn ya ku di 8ê Tebaxa 2020'an de bi erêkirina piraniya endaman hate lidarxistin. Bi vî awayî, tor di amadekirina rapora xwe ya salane de, bi ser endamên xwe yên li herêmên cuda-cuda belavbûyî ve, li gorî standardên taybet yên ku bi yasa û rêzikên navneteweyî yên parastina rojnamevan re li hev digirin, xebatê dike. Ev rapor binpêkirinên ku ji aliyên cuda yên pevçûnan li Sûriyê û her weha ji aliyên din û hêzên derveyî Sûriyê têne kirin tê de belavkirî ne.

Her weha **«Tore-SKJN»** li ser nûçe û raporên rojnamevanî yên ku di demê binpêkirinê de ji alavên ragihandinê yên herêmî ve têne belavkirin û li ser karê navendên şopandin û belgekirina binpêkirinan xwe dispêre; piştî ku wan bi pîşeyî û bi hûrgulî têne piştrastkirin; di heman demê de, heger karîna dîtina rojnamevanê ku rastî êrîşê hatiye hebe, peyvên wî/ê jî têne standin û li ber çav têne girtin.

## Nîşaneya Azadiya Ragihandinê li Sûriyê

Bi rêya şopandina hûrgulî ya tiştên ku li herêmên cuda-cuda têne çêkirin û bi cûrbecûr binpêkirinan li dijî rojnamevan têne kirin, tiştên ku me belgekirine ne gelek cuda ne ji yên ku hin komîte û rêxistinên herêmî û navneteweyî jî belgekirine; wek girtinên xwepêşî (bê tawan) ji aliyê hêzên ewlehiyê û komên çekdar yên beredayî, derxistina tawanên nerast bi sûcê hevkariyê bi alîyên siyasî yan çekdar, û girtina bê sedemên yasayî yan bê gihîştina serbixwe bo dadweriyê.

Di mehên borî de, wek mînak, rojnamevan – di nav wan de yên ku li ser şopandin û belgekirina binpêkirinan dixebitin – ji aliyê hêzên herêmî yên ku bi Hêzên Sûriyê ya Demokratîk (HSD) têne naskirin li Bakurrojhilatê Sûriyê hatine girtin, bi mehna tawanên ewlehiyê yên ne diyar yan jî bi sedema raporên derewîn li dijî wan hatine amadekirin. Ev tişt nîşan dide ku dijwariyek bingehîn li dijî azadiya ragihandinê bi hatina «Rêjîma nû» kêm nebûne, lê şêwazên wan bi awayekî din pêş ketine.

Ev jî di rapora sala 2025 de bi cihbûna Sûriyê li rêza **177 ji 180 welatan** li gorî Nîşaneya Cîhanî ya Azadiya Ragihandinê tê nîşandan, ku wê di nav welatên herî kêm azadiya ragihandinê li ser astengên cîhanî de dide. Ev rêzandin nîşan dide ku mercên xebata rojnamevanî li Sûriyê pir dijwar in ji aliyê azadiya ragihandinê, azadiya nerî û derbirînê, hebeûne alavên ragihandinên serbixwe yên ku li ber zordariyan, serê xwe netînin, û tunebûna ewlehiya pîşeyî bo rojnamevan. Girîngiya vê nîşaneyê ewe ku li ser gelek hoyan radiwestin; wek: (rêvçûna siyasî ،çarçoveya yasayî ،zordariyên aborî ، rêvçûna civakî ،û asta ewlehiya rojnamevan) ،û ev tev jî astengên mezin ên li ber azadiya ragihandinê li Sûriyê nîşan dide.

## Binpêkirinên ku li dijî rojnamevan hatine kirin

Sala borî guherînên siyasî û ewlehî yên girîng li ser qada Sûriyê bûn؛ ku di ketina rejîma Beşar Esed û damezrandina desthilatdarek nû de hat. Lê ev guherîn bi awayekî erênî li ser rewşa azadiya ragihandinê nehatine xuyakirin؛ binpêkirinên nû hatine tomarkirin û pevçûn di herêmên cuda-cuda yên welat de nû bûn, ku ev jî bû sedema domandina dijwariyan li ser rojnamevan di dema karê wan de.

Di vê çarçoveyê de, Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûrî «SKJN» bi berdewamî xebata xwe ya şopandin û belgekirina binpêkirinan li dijî rojnamevan li herêmên Bakurrojhilatê Sûriyê – yên ku di bin kontrola Rêveberiya Xweser ya Demokratîk de bûn – domand. Her weha rewşa azadiyan li herêmên cuda-cuda yên Sûriyê, li gorî belavbûna kontrolê, bi belgekirinek hûrgulî hat şopandin. Ev belgekirin armanc dike ku wêneyek giştî û rastî li ser rewşa azadiya rojnemegeriyê di demek salekî de pêşkêş bike û her weha rewşên ku rojnamevan di dema vegirtina pevçûnan de li herêmên wek Heleb ،Swêda ،herêma beravê û Dimeşqê hatine armanc kirin, nîşan bide. Li van herêman rewşên girtina xwepêşî û êrîşên laşî ji aliyê hêzên girêdayî bi desthilatdarê hatine belgekirin, ku qelsiya mercên ewlehiyê bo karê rojnamevanî diyar dike.

### Ev jî binpêkirinên ku hatine belgekirin:

1- Di **23'ê Adar 2025'an** de, peyamnêrê kanala kurdî «**Ronahî**», **Zîwar Şêxo**, li Berava Sûriyê ji aliyê hêzên ewlehiyê yên desthilatdara Sûriyê hate girtin. Piştî çend katjimêran hate berdan, lê Telefûna wî hate desteserkirin.

2- Di **31'ê Adar 2025'an** de, hêzên girêdayî bi desthilatdara Sûriyê hevkar **Ekrem Salih** – peyamnêrê «*Channel 8*» – û kameraman **Cûdî Hec Elî** girtin, dema ku li herêma **Sehnaya** ya gundewarê Dimeşqê li ser pevçûnan raporê didan. Ew di **1'ê Gulan 2025'an** de hatin berdan.

3- Di roja înê **27'ê Hezîran 2025'an** de, hêzên **«Ewlehiya Giştî»** yên desthilatdara Sûriyê rojnamevan **Hesen Zaza** li paytext **Dimeşqê** girtin û wî ber bi aliyekî nenas birin, bê ku sedemên girtinê were eşkere kirin. Ew di **3'ê Tîrmeh 2025'an** de hate berdan.

4- Di **24'ê Tîrmeh 2025'an** de, peyamnêr **Solîn Mihemed Emîn** – ku ji bo tora medyayî **«Rûdaw»ê** dixebitî – dema ku li **Swêda** li ser bûyeran rapor dide, ji aliyê hin çekdar ve rastî êrîşên devkî û laşî hat.

5- Di **11'ê Îlona 2025'an** de, mala rojnamevan **Ehmed Şêxo** li bajarê **Efrînê** ji aliyê hêzên girêdayî bi desthilatdara Sûriyê, hate talan kirin.

**6-** Di meha **Çirya-Paşîn 2025'an**, komek ji rojnamevan û çalakvanên kurd rastî **kiryarek gefê** li ser torên civakî hatin, her weha navên wan di hin xwepêşandanên ku bi şêweya şerê Sûriyê û encamên wê, têkildar bûn û hatin binavkirin. Di nav wan de hevalên me **(Lewend Hisên, Îvan Hesîb, û Naz El-Seyid)** hene. Li dijî wan **axaftina gefê û nefretiyê** hate belavkirin bi armanca **reşkirina nav û dengê wan**, û wan **bi rêwîtiya mirovahî û hesteyî** hatin armanc kirin, ev jî wan li ber **dijwariyên rastîn** yên ji bo jiyan û ewlehiya wan kesane dihêle.

## Binpêkirinên li herêmên Rêveberiya Xweser ya Demokratîk

Her çend rewşa ewlehiyê li herêmên Rêveberiya Xweser baştir ji herêmên din yên Sûriyayê, bi taybetî li herêmên ku rûdanên tengasî û astengkirina karê rojnamevan bûn, ji ber tirsên ku bi belgekirina binpêkirinên li dijî sivîlan re girêdayî bûn; lê Nivîsgeha Şopandin û Belgekirina Binpêkirinan ya toreyê gelek rewşên girtin û girtina demdemî li dijî rojnamevan belgekirine; lê her weha bangkirinên ewlehiyê û zordariyên rasterast û nerasterast jî hatine tomarkirin, bi sedema raporên rojnamevanî yên ku «li dijî gotara fermî» hatine binavkirin, yan jî ku karê saziyên ewlehiyê û rêveberîî rexne dikin.

7- Di şeva **22–23'ê Nîsan 2025'an** de, hêzên ewlehiyê yên girêdayî bi desthilatên herêmî yên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, rojnamevan **«Cûm'e Ekkaş»**, peyamnêrê torên *(Al-Arabiya û Al-Hadath)* – girtin, û di **25'ê Nîsan 2025'an** de hate berdan.

8- Di roja Çarşemê **2'ê Tîrmeh 2025'an** de, hêzên **«Ewlehiya Navxweyî-ASAYIŞ»** yên Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rojnamevan **«Raman Ebdulselam Hiso»** piştî ku bo yek ji navendên ewlehiyê yên bajarê **Amûdê** hate bangkirin, rawestandin, ew di roja paşîn **3'ê Tîrmeh 2025'an** de hate berdan.

9- Di **4'ê Tîrmeh 2025'an** de, rojnamevan **«Hîba Kûsa»** li **Reqqayê** ji aliyê Hêzên Sûriyê ya Demokratîk (HSD) bê ku tawanên diyar werin dayîn, hate girtin. Ew di **31'ê Tîrmeh 2025'an** de hate berdan.

10- Piştî ku rojnamevan **Fîras el-Bercis** mehêk bi temamî di bin girtinê de ma – ku di **8'ê Ber-Çile 2025'an** de ji malbata xwe li **Reqqayê** ji aliyê HSD hate girtin – ew di **26'ê Çile 2026'an** de hate berdan.

11- Rêveberiya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweser, bo cara duyemîn li pey hev, destûra xebatê nade rojnamevan **Senger Xelîl** – ku ji Kurdistana Iraqê ye – bê ku sedemên wê bi awayekî zelal were nîşandan.

12- Hêzên tûnd ne di nav sînorên Sûriyê de nehatine sînorkirin؛ lê gefe li dijî rojnamevanan ji aliyê hukûmet û desthilatên «bi zorê» yên li Sûriyê bi tenê ne ،lê her weha ji aliyê hêzên herêmî û navdewletî û hêzên derbas-sînorî ve jî têne kirin؛ ku di armancgirtina tîpên rojnamevanî bi balafirên bêmirov (DIRÛN) de xwe nîşan dan. Di **22'ê Kanûna Duyem 2025'an** de, komek rojnamevan li nêzîka **Bendava Tişrînê** li gundewarê **Kobanî** ya Bakurê Sûriyê, ji aliyê balafirek bêmirov yên Tirkî ve rastî êrîşê hatin, ku bû sedema birînên cuda-cuda li laşan wan. Navên wan ev in:

- **Leyla Ebdî** – kanala *Ronahî*
- **Cekdar Hec Mehmûd** – kanala *Stêrk*
- **Muhaned Îbrahîm** – kanala *KNN*
- **Mihemed Badlî** – kanala *Ronahî*
- **Elî Şernexî** – kanala *Ronahî*

## Tundiya berdewam li dijî rojnamevan

Piştî derbasbûna salekê ji ketina rejîma Beşar Esed, hîn jî gelek rojnamevanên ku di dema rejîma wî de yan jî di destê rêxistina "DAIŞ" de hatine girtin yan revandin nehatine dîtin, li gorî Rêxistina **«Rojnamevanên Bê Sînor»**, hîn jî **37 rojnamevan** li Sûriyê di nav windabûyan de ne; gelek ji wan di dema borî de dîlên rêxistina Dewleta Îslamî ya Iraq û Şamê (DAIŞ) bûn, yan jî li destê hêzên Beşar Esed girtî bûn؛ lê her çend rejîma ku welat bi rê ve dibir bû guherî ،lê hîn jî tu agahiyek zelal li ser çarenûs û rewşa wan tune ye. Lê pirsa rojnamevan tenê bi welatekê taybetî têkildar nîne؛ ev pirsek giştî ye ku piraniya welatanên ku şer û pevçûna navxweyî de. Hijmartin nîşan dide ku li seranserê cîhanê **135 rojnamevan li 37 welatan** di nav windabûyan de ne; û gelek ji wan ji bitirî **sî salî** ve nayên dîtin. Ev jî nîşan dide ku pirsa **windabûna bi zorê** ne tenê rewşek nû yan demkî ye ،lê belkî rewşek bi berdewamî û qeraxî ye ku di mercên siyasî û ewlehî yên tevlihev de rû dide. Bi tenê li Sûriyayê **37** ji van rojnamevanên windabûyî hene, ango bitir çaryek ji hejmarê giştî ya cîhanî ya rewşên windabûnê; ev jî Sûriyê dike welatê ku heta îro herî bitir hejmarê rojnamevanên windabûyî li cîhanê tê de tomarkirî ye, her çend bi ketina rejîma Beşar Esed di dawiya sala 2024'an de û vekerina deriyên girtîgeh û zindanan, lê heya îro ew rojnamevan ne diyarin.

Di çarçoveya Sûriyê de jî, rewşên windabûn û girtin li hundirê welat ji aliyê hêzên çekdar û li herêmên ku di bin kontrola komên derveyî çarçoveya dewletê de ne, hatine tomarkirin; her çend dewleta ewlehiyê ya ku herdû Esedan ava kiribû têk çû. Hin raporên navneteweyî jî nîşan dan ku komên di bin ala «**Hey'eta Tehrîr el-Şam**» de ne, hîn jî hejmarek rojnamevan bê tu agahiyên zelal li ser çarenûs û rewşa wan, yan jî bê çarçoveyek yasayî ya azadkirinê, di bin girtinê de digirinö van hejmaran rûyên cuda-cuda yên tundiya bi berdewamî li dijî rojnamevan nîşan dide; wek: **(girtinên xwepêşî ،windabûna bi zorê, girtin û dîlê li destê komên çekdar, û tunebûna mekanîzmên dadwerî û hûrguliyê ji bo eşkerekirina rastiyan yan jî dadekirina berpirsan)**. Her çend guherînên bingehîn li ser qada Sûriyê piştî dawîbûna desthilata Esed, lê bandorên vê derbasbûnê hîn jî di warê dadwerî û berpirsiyariyê de ne temam in. Hîn jî malbatên rojnamevanên windabûyî li benda bersivan li ser çarenûsa yên ku winda bûne ne, û dijwarî hîn jî li ser kesên ku li qada karê rojnamevanî dixebitin maye, bi taybetî li herêmên ku tengasîyên ewlehî û siyasî bi hev ve girêdayî ne; wek Bakurrojhilatê Sûriyê.

## 2025: Sala lêgerîna rojnamevanên ku bi zorê hatine windakirin

Torê Rojnamevanên Kurdên Sûriyê «SKJN» sala **2025'an** weke saleke taybet ji bo berevanî di ber rojnamevanên ku bi zorê hatine windakirin diyar kir. Toreyê dengê xwe bilind kir da ku daxwaza eşkerekirina çarenûsa peyamnêran, rojnamevan û wênevanên rojnamevanî yên ku li Sûriyê bi zorê winda bûne – bi taybetî **(Ferhad Hemo û Husên Îso)** – bike. Ev bangek mirovahî bû ku got:
**«Navan vegerînin bo malbatan wan. Rastiyê vegerînin bo xwediyên wê.»**

Ev gotin ji aliyê heval **Xewla Şebeh** – şîretkarê azadiya nerînê û ewlehiya rojnamevan – di dema beşdarbûna wê ya li kiryara piştgiriyê ya ku toreyê bi rêya projeyek ku çend meh domand pêk anîbû de hat. Ev proje rêzeyek civînên guftûgoyê,

gotar û peyamên piştgiriyê (bi nivîsî û bi vîdyoyê) bikar hat, da ku vê dosyayê bi awayekî firehtir ronî bike. Ev dosya ya herî dijware ku mercên ne aramiya Sûriye ji birtirîn dehsalekê ve derbas dike; ku rastî û her dengê azad armanc dike. Di vê çalakiyê de gelek hevkar û hevrêkên me ji Sûriyê û hin welatên erebî, û her weha çalakvanên berz li rêxistinên navneteweyî wek **(Rojnamevanên Bê Sînor ،Rêxistina Lêbûrînê ya Navneteweyî)** beşdar bûn. Ew bi hev re piştrast kirin ku her çend demê windabûnê dirêj dibe, ew qas êş û kulên malbatên wan kûr dibe, û li benda her hêviyekê ne ku rewşa zarokên wan diyar bibe; her çend ku dadweriya didome, di rêya bikaranîna dademendiya veguhêz, yak u bingeha wê rastiye û nakirina rastiya çarenûsa windabûyan, û dadekirina her kes, aliyên ku berpirsiyarin di ber windabûna wan de, wek mercekî bingehîn ji bo dayîna dademendiyê bo kesên ku winda bûne û yên ku li benda wan ne.

Hemû beşdarên kiryarê piştrast kirin ku rastî tenê bi damezrandina **komîteyên taybet û serbixwe** tê eşkere kirin; ku bi hûgulî û bê tu zordarî yan bandorên aliyên ku li erdê serdestin bixebitin; ku malbatên qurbanan tê de were tevlîkirin û hemû pêkhatinên li Sûriyê bê cûdabûn amade bin. Her weha hat eşkerekirina rastiyê di dosyayên windabûna bi zorê ya rojnamevan li Sûriyê de pêdivî ye, da ku pîşeya «desthilata çaremîn» li pey peymana xwe bimîne, her mafekî xwedî-parastinê biparêze û nîşan bide ku dengê wê winda nabe.

Her weha pêdivî ye ku yasayên Sûriyê (yasayên giştî û **Yasaya Ragihandinê**) werin çalak kirin û bi awayekî ku windabûna bi zorê tawanê bike û serbixwebûna dadgeh û dadwerî biparêze, werin biryarkirin. Bi heman demê, piştgiriya xebata rêxistinên mafên mirovan yên herêmî ji bo şopandin û belgekirina binpêkirinan ji aliyên cuda ve, û bilindkirina dozên dadwerî gava mercên ewlehî hebin, wek yek ji amûrên bingehîn yên piştgiriya mafê berpirsiyariyê û astengkirina bê-tawankirinê, bi taybetî jî ku Sûriye li gorî yasaya navneteweyî ya rewa û peymanên din – wek **«Peymana Navneteweyî ya Mafên Sivîl û Siyasî»** – bi qedexekirina windabûna bi zorê û şopandina wan yên ku vê tawanê dikin, girêdayî ye.

## Mafên ku bi derbasbûna demê re nayên winda kirin

Torê Rojnamevanên Kurd ên Sûrî di raporên xwe yên salane de di nav **heft salên borî** de **50** rûdanên desteserkirinê li ser mal û milkên rojnamevan li herêmên **(Efrîn ،Serê Kaniyê/Ras al-Eyn ،Girê Spî/Til Ebyed ،û Til Temir)** belgekirin. Ev binpêkirin ji aliyê hêzên Tirkî yên ku van herêman dagir kirine, li gel çekdarên Sûriyê yên ku bi wan re alîkar in, bi awayekî berdewam têne kirin.

Her çend rejîma Sûriyê ketibe û bajar û gundên ku welatê dayikê ya van koçberan bûn hatibin azadkirin, lê ew hîn jî ne vegerîn herêmên xwe; bi vî awayî mal û milkên wan hîn jî nehatine vegerandin bo xwediyên wan. Li gorî heşkerekirina hin malbatên ku vegrîne bajarên xwe, berî ew malbatên ku ketibûn malên wan derkevin, car din mal û milkên wan, bêyî ku berpirsiyarên dewletê buhayekî/Alîkarî bide wan malbatên sivîl yan malbatên Rojnamevanan.

Hemû tiştên ku di salên borî de çêbûn tu hesab li ser **yasayên cengê** nekirine؛ yên ku bi awayekî eşkere talankirin û desteserkirina bi hêz li ser milkên taybet bo bikaranîna kesane qedexe dikin, pêre jî wan di nav rêzikên ku vê kiryarê weke **tawanê cengê** diyar dikin, gava ku herêm rastî pevçûnên çekdar bûbe – ku ev alozî bi awayekî

berdewam li van herêman rûdide; yasa û rêbazên di vê babetê de zelal û diyar in; ew rê nade şervanan ku milkên kesane ji bo bikaranîna xwe – heta ji bo bicihkirina malbatên xwe – bi dest bixin.

Li gorî vê yekê, daxwaza desthilatên heyî heta dema nivîsandina vê raporê ne bi armanckirina çareseriyên ku dadwerî ji bo van qurbanan pêşkêş bikin, û ne jî vegerandina malên ku li her sê bajaran **(Efrîn ‹Serê Kaniyê/Ras el-Eyn ‹û Til Ebyid/Girê Spî)** hatine desteserkirin bo xwediyên wan yên rastîn. Ev dosya beşek girînge ji bingehên **Prensîpên Neteweyên Yekbûyî yên «Pinheiro»,** ku yasaya navneteweyî ya bi firehî sepandî di babeta vegerandina xanî û milkê di mercên vegerandina penaber û koçberan de nîşan dide; û diyar dike ku:
**«Hemû penaber û koçberan mafê vegerandina her cûre xanî û/yan erdên ku bi awayekî xwepêşî yan neyasayî ji wan hatiye standin hene.»**

Em bawer in ku **maf bi derbasbûna demê nayên winda kirin**; lê me di vê salê de biryar da ku rêzeyên borî ne weşînin,  ji ber ku pêdivîtiya nûkirina wan li gorî daneyên nû heye; bi taybetî jî ji ber ku gelek hekar û hevrikên me di nav herêmên cuda-cuda de guherîbûn, yan jî ji alaveke ragihandinî kar li yek bin kirine.

## Encam

Agahiyên ku di dirêjahiya **14 salên şerê Sûriyê** de hatine belgekirin, rêbazeke domdara binpêkirinan li dijî **rojnamevanên/ê û xebatkarên/ê qadê ragihandinê** nîşan didin. Ev binpêkirin hemû cureyan digire nav xwe: **«kuştin, girtina neasayî, wenda kirina bi zorê, êrîşên laşî, astengkirina karê rojnamevanî, û girtina amûrên rojnamevanî»**. Ev hemû di merc û hoyên ku azadiya ragihandinê û azadiya raman û derbirînê tê sînorkirin de, hatine kirin.

Gelek rûdan nîşan didin ku **garantiyên bingehîn yên yasayî tune ne**, û ku **pîvanên dadgehên dadperwer** nayên bi cih anîn; her weha bi bikaranîna **belgeyên ku bawername û rêznameya yasayî tunebûna wan tê nîşandan**, mercên **berdewamkirina bêtewankirina tawanbaran,** û **bêkêrhatîya awayên neteweyî yên bersîvdayînê** di lêkolîna van binpêkirinan û dadekirina berpirsiyarên wan, ji ber vê yekê, pêwîste ku **pêşniyarên berê** ji nû ve were destnîşankirin û bi awayekî girîng bi pêwîstiya **awayên navneteweyî yên serbixwe û bêalî** were dûbarekirin; ku ev awa bi berhevkirin, yekgirtin, parastin û komkirina belgeyan re bi kar bê, dosyeyên yasayî yên tevahî amade bike, û bi qurbanî û malbatên wan re têkiliyeke berdewam bête kirin.

Li ser vê bingehê, **Toreya Rojnamevanên Kurd ên Sûriyê «SKJN»**, di hemû raporên xwe yên salane de, careke din **li ser berpirsiyariyên dewletan li gorî Madeya 19 ya Peymana Navneteweyî ya Mafên Sivîl û Siyasî** rawestiye, û di heman demê de **li ser pêwîstiya rêzgirtina rêzikên yasaya mirovî ya navneteweyî** bi taybetî di warê **parastina rojnamevanên/ê ku di mercên şer û têkoşîna çekdar de karên rojnamevanî yên dijwar dikin** de, ji ber ku ew **wek sivîl** têne binavkirin, li gorî biryarên têkildar yên **Encûmena Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî** û **Encûmena Mafên Mirovan**.

Her weha tora me girîngiya **balkêşkirina ser dijwariyên taybet yên ku hevkarên rojnamevan yên jin bi wan re rû bi rû dimînin** diyar dike, û li ser pêwîstiya

**bikaranîna nêrînek ku di hoyên têkildar bi ewlehiya xebatkarên ragihandinê de rêz tê bigire** radigihîne. Ji ber ku **ewlehiya wan, parastina ragihandina azad û rojnamegeriya serbixwe ye**, hinek ji pêşniyarên bingehîn in, çimkî ew bingehên sereke ne ji bo **xurtkirina serdestiya yasayê, parastina mafên mirovan**, û **piştgiriya civakan bo guherîna demokratîk ya tê xwestin**.

---

**Tora Rojnamevanên Kurd ên Sûriyê**
**Nivîsgeha Çavdêrî û Belgekirina Binpêkirinan**
Qamişlo – 14/2/2026